

Dr. Mihemed Meşûq Xeznewî

Nivîsa jêrîn axaftina dîrokî ya şêxê şehîdan, zanyar Dr. Mihemed Meşûq Xeznewî ya di 8/4/2005an de ye. 5 hefte berî ku ew ji alîyê rejîma Sûrîyê di 10/5/2005an de bê revandin ev axaftin kiribû. Ev şehîdê hêja, ji ber ku ev peyvên rastî û dadmendîyê kiribûn, heta bi mirinê bi êşkenceya hovane rûbirû mabû; laşê wî yê jihevxiştî di 1/6/2005an de radestî malbata wî kirin. Xwedê jê razî be û bila cîhê wî bihuşt be:

Ew peyveke xatir xwestinê bû?

Ew li ser xwe dipeyivî?

Erê, wî bi awayekî pêşin tûk kiribû rûyê qesasên xwe.

Bi navê Xwedayê dilovan û mihrîban

Birayên hêja

Hevalên hêja

Her kes dizane ku ez tucarî tev li cenazeyan nebûme û kesên nêzîkî min dizanin ku ez tev li salvegera mirina bavê xwe yê rehmetî jî nabim. Ez yek ji wan kesan im ku heke nikanibin mirinê li jîyanê vegehnin, pêwîstî bi pîrozkirina mirinê nahînin. Ji ber vê yekê ye ku ez îro li vê derê di nav we de me: ne ji bo salvegera yekemîn a Ferhad e, ne ji bo şwîngirtina mirina wî ye. Ez li vir im ku jîyana wî û jîyana gel û netewa wî pîroz bikim. Ez pir bextewar im ku bi we re jîyana vî zilamî pîroz dikim. Lê belê, ez her weha pir xemgîn im, ji ber ku bêtirî bîst şehîdên me hene ku salvegera wan a yekemîn bêyî ku jîyanên wan ji alîyê netewa wan bê pîrozkirin derbas dibe.

Farhad delalîyê ber dilê me hemûyan e. Ez vê yekê li gel rêzgirtina herî bilind ji bo hisên bav, dê, jin û keça wî dibêjim. Erê, ew delalîyê me ye, lê belê kî dikane bibêje ku bîst kesên din û hinek şehîdên me ne di heman asta Ferhad de ne?

Çima salvegerên wan derbas bûn û hun bê tevger, di xew de bûn? Çi we dixê xew? Çima hun bawer nakin ku jîyan dikane ji bo mirîyên wek min û we jî bê dayin?

Birano, maf ji bo xêrxwazîyê nayên dayin, lê belê ew bi darê zorê tînin sitandin.

Her dilopeke xwîna şehîdan divê li wê derê be ku rehekên mafên we av bide û divê ji nuha û pey ve em nehêlin ku şehîdên we bînin jibîrkirin. Şîa ne çewt in ku her sal Husên bibîr tînin; zilamekî ku

hezar û çarsed sal berê hatiye şehîdkirin, lê belê netewa wî, Şîa hîn jî xwîna wî pîroz dike, ne ji bo ku ew zilam miriye, lê belê ji bo ku ew dixwazin komekê, netewekê, Şîyan, bi hêza xwîna wî vejînin.

Dibe ku ez bi hûrgilî fahm nekim ku çi bi serê Ferhad de hatiye.

Ez yek ji wan kesan im ku ji qemçûran (qarmîçe) pir ditirsin û ez naxwazim ku wan bîbîr bînim. Lê belê ji ber ku bavê wî ez ji bo vê civînê vexwendim, ez nizanim ku çima Yaser û Sumayah tê bîra min. Yaser, yek ji wan hewariyên hêja bû ku êşkencekarên wî tenê ji bo ku gotineke xerab ji bo Mihemed bike, soza hemû rehetî û azadiyê dan wî, lê belê wî qebûl nekir û Sumayah jî qebûl nekir, bi ser de jî tûk kir nav çavê Ebû Cehîl. Çîrok bi vî awayî ji min re hat gotin. Ji Ferhad jî hat xwestin ku gelê xwe piçûk bixe û ez nizanim ku wî tûk kir nav çavên wan an na, lê belê bi rastî, her kesê ku bixwaze ku merivek gotinên xerab ji bo gelê xwe bike, divê meriv tûk bike ser çavên wî.. Destûrê bidin min ku ez hinek agahîya bi kitkit bidim we, ji ber ku di vê civînê de wek seydayê olî ez bi tenê dipeyivim.

Ferhad, min ji bo te hinek peyv nivîsîne; ez ne helbestvan im, lê belê ez dikanim êşa xwe û êşa gel û netewa xwe bi rêya te his bikim, Ferhad.

Hemû ciwanên me tu ne.

Jinên me gişt li ser te şwîn digirin.

Hemû rayên xwîne yên zilamên me xwîn bûne.

Hemû rayên xwîne yên zilamên me ji êş û birînan dipeqin.

Lê belê ji bo ku tişteke pêk were, divê zilamên me wek te bimirin; neteweke mirî ji alîyê zilamekî ve tê vejandin, neteweke ku xwe wek mirîyan his dike, jê re mirovek pêwîst e ku bêje, rabe! Tu ne mirî yî! Ew kes jî tu bû, Ferhad.

Min hewl da ku te bînim pêş çavên xwe, tu kî yî? Maqûl e ku meriv biçe salvegera kesekî ku meriv wî nas nake? Tu kî yî? Min hewl da ku taybetiyên te bînim pêş çavên xwe, lê min nedikanî. Her cara ku min hewl da ku taybetiyên te bînim pêş çavên xwe, dengê qîrînên te yên ji ber qemçûr ket guhên min û her cara ku min hewl da ku bejn û bala te bînim pêş çavên xwe, şokên elektrîkê yên ku di laşê te yê nazik re derbas dibûn dihatin pêş çavên min. Dema ku min hewl dida ku guhdarî bikim, min girîyê te dibihîst. Ez nizanim, dibe ku dema ku ez dibêjim tu girîya, ez te kêma dihesibînim, ji ber ku kesên wek te

natewin û nagirîn, lê belê li hemberî înfazkaran wek çîyan ji pêyan disekin. Lê belê, bihêle ku ez ji te û hemû şehîdên vê netewê re bibêjim, Ferhad, ku em hemû tev li rijandina xwîna te bûne, ji ber ku em demeke dirêj di xew de man û me tu radest kir û me giştan qedrê te û hevrêyên te şikand; me li we nepirsî, me neda dû înfazkarên we û me darizandina wan nexwest.

Fermana berdana girtîyan ji girtîgehê hêsan e, lê belê ne mimkun e ku meriv bi fermanekê jîyana Ferhad û bêtirî bîst şehîdên me yên din bi şûnve bîne; lê belê tu û tenê tu dikanî li jîyanê israr bikî û xurt raweste ku mafên xwe yên mirovî doz bike.

Dema ku efser ji esker pirsî: Hun kî ne?

Divya wî bigota: em kûçik in.

Lê belê ji dewsa wê, wî got: em mirov in û ji ber wê yekê bû ku wî bi bota xwe ya leşkerî lêxist.

Fermanên we dikanin wan hemûyan vejînin. Heke hun bixwazin ku mirov bin, hun mirovên Ferhad.

Ez dizanim ku serfirazîya Xwedê nêzîk e, lê belê divê em hêvî bikin ku berî ku zîlamê me yê herî lawaz li ser gora te raweste û bibêje ku em şehîdên xwe vedijînin, da ku em xwe bi wan vejînin, em gişt ne miribin. Bila dayika te destûrê bide min, Ferhad, da ku bibêjim: heke min bikanîya ji ruhîstî bixwesta ku bihişta ku min hinek kesên din têxista dewsa Ferhad, muhtemelen nivê gelê te wê ji dewsa Ferhad biçûya, ji ber ku ew ji xwe mirî ne û pêwîst nake ku meriv bang li mirîyan bike.

Îro ez dibêjim ku em bi niyet in ku hemû kesên ku we kuştine vejînin, tiştên ku we hilweşandine ji nuh de ava bikin û hemû tiştên ku we xera kirine rast bikin. Ferhad û kesên din ên wek wî wê bibin tovên tiştên bihê û her tovek ê sedên wek xwe bîne û Xwedê wek ku dixwaze ji bo hemûyan zêde dike. Jinên me wê bi hezaran zarokên wek Ferhad bînin dinyê û kesên ku guneh kirine wê di çînîna bagerê de lê hay bibin.